MUZÎK Û HINER



★ Sal 2 ● Hejmar 5 ● Pahîza 1981 - 2593 kurdî ★

SOSYALÎZM

BIJÎ ŞOREŞA COTMEHÊ

www.arsivakurd.org

F O L K L O R

ŞÎRÎNÊ LEYLANÊ

Dengnivîs:- **NÛRA CEWARÎ**
Ermenistan.



Şîrînê leylanê, Leylanê
Şorê ba biçîne seyranê
Şîrînê hem gul, hem rîhanê
Şîrînê Leylanê, Leylanê

Be to delêm çawî çawim
Le ser to zoryan lêdawim
Le min waye xelatkirawim
Şîrînê Leylanê, Leylanê

Be to delêm çawestêre
Xizmetêkman pê bispêre
Her em şewman mawe lêre
Şîrînê Leylanê, Leylanê

www.arsivakurd.org

Her wa derwa lencey deke
Serî memkî geman deke
Wexte boy bibme cûleke
Şîrînê Leylanê, Leylanê

Qesem be zulfî çîn-çînit
Be cût şemamey rengînit
Gawir bûm hatme ser dînit
Şîrînê Leylanê, Leylanê

LEYLÊ



(Leylê, Leylê, Leylê xanê)3
Leylê, Leylê, Leylê canê

Bin çava da min dinhêre
Leylê, Leylê, Leylê xanê
Bin çava da min dinhêre
Leylê, Leylê, Leylê canê

www.sivakurd.org

Barkir barê heft deva ne
Leylê, Leylê, Leylê xanê
Barkir barê heft deva ne
Leylê, Leylê, Leylê canê

Şerê deva ser kudka ne
Leylê, Leylê, Leylê xanê
Şerê deva ser kudka ne
Leylê, Leylê, Leylê canê

WERE WERE PERÎŞANÊ

Dengnivîs:- **BEŞÎRÊ BOTANÎ**



www.arsivakurd.org

Çiyayên me pir bilind in
Gundên me ciwan û rind in
Were! Were Perîşanê!
Were! Were bênemayê

Yên ku ji me hez kirine,
li seyranê digerine
Were! Were Perîşanê!
Were! Were bênemayê!

Min hez canê te kirîye
Min tiştek bo te kirîye
Were! Were Perîşanê!
Were! Were bênemayê!

Guhê min li dengê te ye
heyfa min li singê te ye
Were! Were Perîşanê!
Were! Were bênemayê!

Cihên me di odê da ne
Mêhvanên me tev têda ne
Were! Were Perîşanê!
Were! Were bênemayê!

Çima em car-car sivik in?
Divê jîna xwe xweş bikin!
Were! Were Perîşanê!
Were! Were bênemayê!

www.arsivakurd.org

BARAN

Dengnivîs:- **BEŞÎRÊ BOTANÎ**



Baran barî, baran e, werin lo lo! Baran e lo!
Baran barî, baran e, kodarê tev baranê!
Baran, baran dibarit! Baran e! Baran e lo
Gundîno! Werin kom bin! Li baranê, baranê

Baranokên biharan, baran e! Baran e lo!
Ter dibit bejnên yaran, li baranê, baranê
Xew xweş e di gel haran, li baranê, baranê
Xweşî ye li ser giran, li baranê, baranê

Baranokên havînan, baran e! Baran e lo!
Ter dibit bejnên canan, li baranê, baranê
Xew xweş e di gel c'wanan, li baranê, baranê!
Hênik e li ser çiyan, li baranê, baranê

Baranokên pahîzan, baran e! Baran e lo!
Ter dibit belgên gwîzan, li baranê, baranê
Xew xweş e di gel qîzan, li baranê, baranê
Sema ye li ser berzan, li baranê, baranê

www.arsivakurd.org

Mîqam

Dengnivîs:- Xuşka **NÛRA CEWARÎ**
Duktora hunermendiyê,Ermenistan



JI BO WELAT

Dengnivîs:- **BEŞÎRÊ BOTANÎ**



www.arsivakurd.org

FOLKLORA ÎRO

D A Y Ê !

Helbest û awaz;-
B.Botanî


Da-yê dilê xwe her me-ke bi xe - me

Dayê! Dilê xwe her meke bi xem e
Jîna min borî ez qurbana te me
Lê lê dayê! Min divê we bibînim
Dayê delalê! Ez li hêviya we me

Ji derdê xerîbiyê ez helyame
Dayikê heyran! Va ye ez nemame
Li vir bîna mirovan tim teng dibe
Xwezî ji hevalên xwe neqetyame

Mixabin ez li vir her bi tetê me
Jîn her ne tiştek e, ger ez bê we me
Ez bêkes bûm ji ber dûriya welat
Xwezî ez ji Kerkûkê nehatibûme

www.arsivakurd.org

AVA XABÛR

AWAZ:-B.Botanî



www.arsivakurd.org

ARAM TÎGRAN

Ji bo fêrbûna muzîkê

Berhevkirin û amadekirina: B.Botanî

DEMÊN HIŞBÛNÊ (RAWESTAN)

Mirov di wan deman de nastire û muzîk jî lênaxe.

Hişbûna Dengê Temam	Hişbûna Dengê Nîvdeng	Hişbûna Dengê Çarek-deng	Hişbûna Dengê Serbin	Hişbûna Dengê Nîvser-bin	Hişbûna Dengê Çarek-serbin



Dengê Temam (Nota-Temam)	Dengê Nîvdeng (Nota-Nîvdeng)	Dengê Çarek-deng (Nota-Çarek-deng)	Dengê Serbin (Nota Serbin)	Dengê Nîvser-bin (Nota Nîvser-bin)	Dengê Çarek-serbin (Nota Çarek-serbin)

www.arşîvakurd.org

RÊKA PIYASÊ



Şêrkoyê Botanî

Viyan sibê zû ji xewê rabû. Serê xwe ji balgiyê rakir, çavên xwe vekirinûdi nav lihêfê de ma. Berê xwe da pêş xwe û hizir kir.
Demekê bi ser de çû, ewêxwe rast kir û ji textê razanê rabû û ber bi pencerê çû. Gava perde vekir, tîrêjên roja biharê daketin odê. Ode pir ronahî bû. Belgên daran û hêşînahiya erdê, di vê demê de bi timamî kesk bibûn. Vêde wêde gulên sor, spî û zer belav bibûn û dêmena biharê ciwantir kiribûn. Dema Viyanê pencere vekir, got: "Aaah! Bayê biharê çi hênik û zelal e... Bêhna mirov vedike. Hema weke dengê bilûrê ye. Awazên bilbilan jî, ji nêzîk û ji dûr ve dihatin bihîstin. Pelîtaneke rengîn li ser guleke spî danîşt. Demek kurt ma, paşê firî û nav bayê biharê windabû. Viyanê bi xwe wê dêmenê dît û axîneke dirêj ji kûratiya dilê wê hate der û got: "Aaax ! Dûriya welat! Bihar ne ew bihar e, derdê min jî pir dijwar e. Bê mal, bê dost û bêkes. Çavên xwe nuqandin, dîsan hizir kir û helbesteke ciwan yekser hate bîra wê"
(Derd û dax im, bê qerar im, bê bihar im,
bê çîmen
Bê hebîb im, bê tebîb im, hem xerîb im,
bê weten)

www.arsivakurd.org

Aaaah! Helbestvanê bê çîmen û derbeder! Viyanê jî di wê demê de cixwest bêje ku, ew bi xwe jî derbeder û bê welat maye. Lê ka?! Ka ew helbestvan? Piştre çavên xwe vekirin û çend dilopek ji hêstirên şînî li ser hinarokên riwên wê, yên nazdar hatin xwarê. Hema wek baranokên biharê bûn... Li gel awazên girînê.

(((S Ê L I K)))

Temo!

MUZÎK Û STRANÊN
FOLKLORÎ Û NÛ
BI DENGÊ TENÊCÛRVANÊ
MEZIN T E M O
HATE BELAV KIRIN !

BEŞÎR BOTANÎ

RÛBARÊN SORAV

(H E L B E S T)

WEŞANÊN ARMANC 10

www.arsivakurd.org

Dr.N.ZAZA dibêje:-

★Eger ji îro bi şûn da em guh nedin folklora xwe(her texlît fen û hunerên gelêr)wê winda bibe û here.

★Tiştê ku me kiriye,çi qas piçûk be jî, em bawer in ku wê bi kêrî milet bê û em hêvîdar in ku xwendewarên me nemaze yên ku di nav milet de dijîn bi kira me ya kêmbiha dilgerm bibin, qîmeta folklora xwe ya gelek zengîn nas bikin û stran, çîrok, destan û efsaneyên xwe yên gelêr bicivînin û wan rojekê bidine çap kirin.

12-11-1980

★ CEJNA KOVARA "MUZÎK Û HÎNERÊ YE."



MEYDANA VALA!

www.arsivakurd.org

T E M O

Amadekirina
B.Botanî

Tenbûrvanê mezin T E M O gelek ji corên miqamên rojhilatî(şerqî)dizane. Dikare jî muzîkê bi dahênanî, hunerîn û bi hêzî lêxe. Her wisan dikare awazên giranbiha jî çêbike. Ew ji muzîka xwe xuya ye ku ew bi hest(şiûr-îhsas) û mebest e(meqsed) û armanceke wî ci vê jînê de heye. Berdewambûna wî li ser muzîkê, ne bi tenê pêşxistina hunera kurdî ye. Lê belê bi giştî pêşxistina hunerê ye.

T E M O bi muzîkê serê mirovan xweş dike. Mirov bi serbilindî jî dikare bêje ku ew mirov e. Mirovekî bi evîn e. Bi evînê jî çekdar e. Bi karê xwe radibe û evîna xwe jî diyariya gel û welat dike.

Jîna T E M O gelek tarî û zehmet bû. Niha jî heye ku zehmetir e. Xweşiya wî gul, helbest, govend, muzîk, dêmen, heval û mirovê hejar e. Rêya wî jî aştî, azadî û rizgarbûna Kurdistanê ye.

1- Kak Temo! Te xwe bi pêşxist, gelo ma tu dikarî muzîka kurdî pêşbixînî?

T E M O:- Na xêr, ez bi tenê nikarim. Lê ez dikarim çend awazan bo nmûne çêbikim.

www.arsivakurd.org

2- Bira tu dikarî sozeke rast bicî ku NOTE bixwinî?

T E M O:- Erê, ev jî li ser min rawesta ye. Ez hêvîdar im ku, xwe baş fêr bikim.

3- Çima tu pirtûkekê li ser folklora kurdî çap nakî?

T E M O:- Ez li ser vê dixebitim. Ez hêvî dikim ku, rojekê pirtûkeke holê çap bikim.

4- Temo can! Çima piraniya gelê me bi çavekî nizim li hunerê û li hunermendan dinêrin?

T E M O:- Ji ber ku gelek tevlihevbûn di nava gel de heye. Lê ev çewtiya han ne ji destê gel e.

5- Gelo hunermendên rastîn dikarin ku bi hunera xwe piçekî rêya nijadperestî û keysbazî biguhêrin yan na?

T E M O:- Belku dikarin, çima na! Ev jî li ser gel dimîne.

6- Programa te ya hunerîn çi ye? Û çima zêde nakî?

T E M O:- Ez gelek caran beşdarî konsertê dibim. Ez ê pirograma xwe jî zêde bikim û awazên dastir bo evîndarên hunerê pêşkêş bikim.

Pir sipas, em xweşî û pêşveçûnê ji te re dixwazin.

T E M O:- Pir sipas û ez hêvîdar im ku, kovara "Muzîk û Hiner" bêtir xizmeta hunerê bike.

Gelî hevalan! kovara "Muzîk û Hiner" dosta hunermendên zana, yên ku dixwazin bi bingeh û bi zanîn xizmata hunerê bikin. Ji lew re ev kovara han sozê dide wan ku, her dem bo xizmetê amade be. Kovara me jî pêşveçûn ji hunermendê rastîn re dixwaze. Da ku, navê Kurdistanê, gelên wê û hunera wê bilind bibe.

www.arsivakurd.org

PRÎSKÊ MHOYÎ

Berzvarê , ber derê klûba gundê Fêrîk (nahîya Ecmî azinê)meriv bere-bere top dibûn. Ji ber derê klûbê, ku berpala gund hatîye çêkirinê, dîdema gundê tomerî rind dihate kivşê...Fêrîk şêne, Fêrîk gulvedaye... Bestê dorberê gund hêşîn dikin. Fêrîkyê xebathiz me ra wî li ser mila ji deştê vedigere. Bengz û rêvaçûyîna wî ra tê kivşê, wekî ew bi guman hîvîya berê xebata xwe ye helal e. Baharê xweli rind kewrek kirîye, baxê trîya wede da vekirîye, darê fêkîya li fesal kurtisandî ye û niha jî bêcer û qnyat dike, her tiştî dike, ku berê xebatê dha gelek be...
Legleg îdî zû da hatine, li ser darêd qelemê ye bilind hêlûnêd xwe da cûcik derxistine, hîvîyê ne, ku ewana wê kengê firakevin...
Fêrîkîya pey xebata rojê ra ber bi klûba gund dilezandin. E´lametîk dîwarê klûbê xistibûn: „19-ê îyonê sera klûba gundê Fêrîk da, zivarê seheta 9-a koma klam-reqasê ye xweefrandinê, ku rex klûbê heye, pêşda be" ,- wêda hatibû nvisarê.

www.arsivakurd.org

Dengê xort û qîzan, ku îdî berev bûbûn û berî destpêbûnê cêrbandin dikirin, ji avayê klûbê derdiket, nava hewê da perwaz dida û li gund bela dibûn. Cmaeta gund ber bi wî dengî diçû.

Koma me, serekvanê komêyî bedewetîê Zaharê Efendi dibêje,_ sala 1975-a hatîye sazkirinê. Nava wan sala da me cerbandineke pir dest anîye. Gele klam _reqasêd cmaetê ye.qedîmî me veçêkirinê û kirina nava rêpêrtûara xwe. Lê telebext ra eva salek_dudu bû. ku komê şuxul nedikir, çimkî sazbendê me tunebûn.

Çend meh pêşda Zaharê dîsa kom da sazkirinê, dîsa ji kilûba gund dengê klam û reqasa kurdî hat, ahilê gund be hemdî xwe dîsa xwe klûbê girtin, bin sewtê mqama da tizbîê xwe kişandin...

Sera klûbê bi cmaetê ve kimkimi bû. Serevendi bin sewtêd nazik da cêrga xort û qîza ye qeşeng hêdîhêdî ber bi kûraya dikê dibir.

Vê gavê komê da 17 xurt û qîz hene. Ew xweyê pêşekê başqe-başqe ne. Dengê dengbêj û reqasçîêd xweyşureg Zaharê Efendî (serwerê klûbê), Sonîka Wekil (kolxozvan), ŞemmaTeyar (şagirt), Kulilka Rostem (kolxozvan), Bişarê Emer (xwendkar), Xatûna Emer (şagirt), Casimê Emer (kolxozvan),Tornê Sûrên (xwendkar) û êd mayîn gelekî hazira xweş dihat.

Ewana çiqasî ji pey xebata rojê ra westîyayî bin, dîsa bi hizkirin wedê kivşkirî berev dibin.

www.arsivakurd.org

Û wê rojê ji ber cmaeta gund pêşda hatin, şuret û merîfeta xwe nîşan dan.
Rêpêrtyara komê dewlemend bû. Wêda klamêd "Nûre-Nûre","Koçerê", "Bûkê delalê", "Her sosin", "Herne pêş", reqasêd "Hoy narê", "Dêrê", "Zorê", "Sêpê", "Sekme","Laçî", "Romanî", 'Tenzere", û êd mayîn hebûn.
Konsert kuta bu. Cmaet bi dilparistan ji seraê derdiket. Û gava hinekî ji klûbê dûr ketim, min texmîn kir, wekî mqam paşda gazî min dikin, sewtêd kijana usa şewat, dilovan û nazik bûn..
Em nêzîkî serwerê para nehîêye kultûraê A. Têptêryan bûn.
Tiştekî şabûnê ye,_ ewî got,_ wekî emekê Zahar deya neçûye. Bi saye xebata wî ye xwenehêvşandî îro komeke tam ber me pêşda hat. Nenhêrî wê yeke, wekî kêmasîêd komê ji hene (mesele, rihalê komê ye anagor tune ne, hela şermokî cem endemê komê tê kivşê û tiştêd mayîn), lê kom bere-bere radibe ser qedemê xwe. Emê bixebitin, ku kêmasîêd komê bidne hildanê û her mecala biefrînin bona paşwextîê kom dha bi serfinyazî pêşda bê û bi firetî bê naskirinê.

Prîskê Mhoyî

(Mqaledarê meyî mexsûs).

RIYA TEZE, No 50 (3372)

24-ê ÎYÛNÊ SALA 1981

www.arsivakurd.org

((KOMELEYA ÇANDA CIVAKIYA KURDÎ-LIBNAN))

Ji bona çi neyartiya çanda kurdiya pêşverû dikin?

Amadekirina:-
hevalekî hêja

Roja duşemê li 8/6/1981 an de, cestên bi gemarî bombeyek li ber dergehê komeleya çanda civakiya kurdî danîbûn. Ew bomba teqiya. Hemî derî û pencereyên wê yên darînî û dîndoqîn pelaxtin.û şikestin. Pisporê leşkerîn giraniya wê bombeyê bi pênc kîlo giraman texmîn kir. Komelê beyanek bi derxistibû tê de gotin: Ku wê peqandinê, dîwarên baregehe komelê û hemî derî û pencereyên darînî û dîndooîn pelaxtin û nundirê komelê wêran kiribû.

Beyana komelê aliyênku li pişt hilweşandin û pelaxtinê radiwestin bersûç kiribû. Gotibû ku komela dê ji gelê xwe re dilsoz be û ewê pêwîst ji bona kurdan xebatê bike, ta ku tenga wan ya çandî û civakî bi pêşbixîne.

Bijî Azadî! Aştî! Huner û Evîn!
Bijî komeleya çanda civakiya kurdî!
Bijî Kurdistan!
Mirin, rûreşî û neman bo dijminên hunerê!

www.arsivakurd.org

K I L A M Ê M I N !

Eskerê Boyîk
Ermenistan

KILAMÊ MIN KADÊ ÇIYA NE,
TENDÛRA DIL DA PIJÎYANE,
SER RÊ DIRBÊ ÇIYA RIJÎYANE,
TAMKIN! TAMKIRINÊ HÊJA NE...
KILAMA MIN MÎNA HEWÊ
BIFIR! HERE PIŞT HEFT ÇIYA!
BIFIR! MÎNA SIYARÊ EGÎT!
XWE RA HILDE XEMLA KURDA!
DILSAXÎYA KURD XEYSETE ÇÎYA
SERFINYAZ BÎ TE HEMÛ ÇIYA
XETA KLAMA MIN GOVENDA KURDA
TEQLA WÊ, REQASA DELAL Û RINDA
XEMLA WÊ, KESKESORA BIHARÊ
ŞEMLA WÊ, ÇAVÊ NAZIK NAZDARÊ
RUHÊ WÊ, DILÊ DÊ DEWATE KURDA
KELA WÊ QEYDÊ SIYARÎYÊ KURDA
KLAMA MIN, RUHÊ MIN E EMR DA
ÇÎYAYÊD ME BILÛRVAN IN
TU BILÛRA SER LÊVA WAN
CIMETA MIN!
DENGÊ KANYÊ ME MIQAM IN
TU JÎ RUH Î LI NAVA WAN
ZIMANÊ MIN!!!
EZ JI SEWTA TE ME CIMET-
BEXTÊ TE RA DILERIZIM
DENGÊ TE RA DIVIM QEWAT
DIVIM MIQAM BELA DIBIM...

www.arsivakurd.org

NAMEYÊN HEVALAN

. Ez cejna kovara we pîroz dikim. Hêvîdar im ku hûn berdewam bin li ser kar û xebata rastîn.

Dildar Silo-Mamoste-Libnan-

. Karê we pir baş e. Ez cejna we pîroz dikim û çavên we maç dikim. Lê gelek mixabin ku piranîya hevalan rexne li ser Beşîrê Botanî û li ser kovara delal digrin. Va ye ez pere û sipasan bo we dişînim û pir sipas.

S.D-Xwendevan-Elmanya-

Diyariya Kovara MUZÎK Û HINER , ji evîndarên hunerê re!

B.Botanî



NÛÇE

ÎRANA BINDEST

Li Tehranê, di roja 28 ê hezîranê de, çend bombên pîroz mizgîniyeke baş ji cîhanê re dan. Di wê rojê de bêtir ji 75 misilman yên ku li dij aştî, azadî, evîn û hinerê radiwestîn hatin kuştin. Misilmanê sitemkar M. Behiştî, yek ji wan bû.

Di roja 30 ê tebaxê de, miz giniyeke hîn baştir hate dan. Ew ji peqandina kansiliyê bû. Nêzîkî 17 misilman yên ku ew jî li dij aştî, azadî, evîn û hinerê radiwestîn hatin kuştin. Misilmanê xwînrêj Recayî û Bahonar ou kesên pîs li gel wan bûn.

Her wisan ji roja 28 ê hezîranê û ta bi niha, Xumeyniyê împeryalîst tola hevalên xwe yên pîs distîne û nêzîkî 4500 misilman ji misilmanên "Mucahîdîn" jî, ji biryarên wî hatin kuştin, nêzîkî 10 000 ji aliyê partiya îslamî ve hatine girtin û hindek ji wan jî zarok bûn...

www.arsivakurd.org

Tenbûrvanê yonanî yê mezin Gregorîs Tzîstouoîs, par ji aliyê polîs ve hate girtin. Polîs biryar da ku hîç mafê wi tuneye ku tenbûrê di zîndanê de lêxe. Polîsên sitemkar ji dema biryarekê didin, ji axiftinên xwe venagerin û naguhurin. Tenbûrvanê me ji dilxemgîn, neçar û bêzar di zîndanê de ma.

Tenbûrvanê bêguneh, nêzîkî çar meh di zîndanê de mabû û piştre azad bû. Lê ewî bi xwe nedizanî ku ji ber çi hatibû girtin?! Polîs jî aşkere nekir. Dema ku tenbûrvanê sitembar ji zîndanê derket, yekser dest bi muzîklêxistinê kir. Da ku xwe amade bike. Lê neşiya ku weke berê muzîkê lêxe û gelekî paşde ma...

BEŞÎRÊ BOTANÎ

BISTIRE !

((MUZÎK Û STRANÊN FOLKLORÎ))

BIXWÎNE Û BELAV BIKE!

www.arsivakurd.org

. Hinermendê rastîn dikare pesna rewşa xwe, gelê xwe, sirûşta welatê xwe û tiştên din bi muzîkê bide...

. Hinermendên zane bi xebata rastîn digihên hêviya xwe ya ji bo doza hinerê. Ji lew re jî divê em ji îro de destpêbikin.

. Divê hinermendê zane hinera gelê xwe ji nemanê biparêze... Bi helbest û awaza stranê nelîze û neguhire...

. Yê ku bixwaze jîna xwe pêşbixîne!
Dive muzîkê bixwîne!

. Jîna mirov bi muzîkê jîn e!
Laşê wî jî her dem bi evîn e!

. Mirovê jîr, ji muzîkê re tî ye. Çiku muzîk jîn e û jîna bê muzîk, wek erdê be av e.

. Jîn bi hinerê rengîn dibe. Ciwanî û xweşiya wê muzîk e!

B.Botanî

Xudan û berpirsiyarê kovarê B.Botanî

Ji bo alîkariyê, postgirokonto 453 46 47-5
Bashir Botani-Sweden.

www.arsivakurd.org